Akademîsyenên Ermenî Avakirina Dewleteka Kurdî Ji Ermeniyan Re Xeter Dibînin

Pîr Dîma

Peywendiyên dîrokî yên ermeniyan û kurdan gelekî kevin in. Ev herdu netewên kevin ji mêj ve cînarên hev û du bûn û baş zimanê hev dizanibûn û taybetiyê hev de pir şareza bûn. Gelek lêkolîner, nivîskar û hunermendên ermeniyan wek Xaçatur Aboviyan, Yêgîazarov, Komîtas, J. Orbelî û hwd.. dostên gelê kurd bûn û ew di berhemên wan hêjayan de xuya dibe.

Di dawiya sedsala XIX û destpêka sedsala XX lekeyeke reş kete ser peywendiyên wan du netewan. Osmaniyan qirkirina ermeniyan di împaratoriya xwe de ji xwe re kirin armanc û ev kar bi destê eşîretên kurdan dixwestin bi cîh bihînin. Siltan Ebdilhemîdê II "Alayên Hemidiyê" damezirand û piraniya wan ji siwarên kurdan pêk dihatin. Wî çaxî dewleta Osmaniyan dikete rewşeke dijwar û teng û nizanibû bi çi awayî hilweşandina împaratoriya xwe bide rawestandin(1)(r.241). Sîxûrên îngîliz dest bi propagandayê kirin di nav ermeniyan de û girfta alîkariyê dane wan ku piştgiriya wan bikin di karê vejîna dewleta Ermenîstanê de(2)(r.137). Vê propagandayê hêviyê ermeniyan zêde kir, bi taybetî partiya Daşnaksûtyûn ya ku çi derfet hebûya jî ji destê xwe bernedida. Mayevskî konsolosê Rûsya li Wanê dinivisî ku bi rexma wê ku bazirganên ermeniyan bi selefxurî û fêlbaziyên xwe axa û begên kurd dixapandin dîsa jî hale wan di Kurdistanê de ji misilmanan çêtir bû. Dema endamên Daşnaktsûtyûnê belgenameyên propagandayê belav dikirin û digotin ku rojhelata dewleta Osmanî dê bibe Ermenîstan û misilman bibin bindestê wan, begên kurdan ev gotin xeternak hesibandin. Parek ji ronakbîrên ermeniyan bi vê propagandayê sermestbûyî bawer dikirin ku ermeniyên ku li rojhelata împaratoriya Osmanî bibûn kêmnetewe di nav kurdan de dê dewleta xwe ava bikin û bibin desthilatdarên welatî ku ji piraniya wan kurd bûn(3)(r.30-31).

Karmendê leşkerî yê rûsan Kartsêv dinivîse ku serwerê çend grûpên ermeniyan dest bi talankirina gundên kurdan kirin û ev bû sedemê destpêka alozî û dijminatiyê navbera kurd û ermeniyan. Kartsev qala

serwerekî wesa dike bi navê Kûkûnyants li devera Qersê(4)(r.31). Di vê navberê de ermeniyên cotkar û merivên sade jî bûn armanca vê nakokiyê. Tirkan jî ev derfet ji destê xwe bernedan û agirê dijminatiyê zêdetir gur kirin. Ewan bi dizîkave digote serekeşîrên kurdan ku berî ermeniya bidin û dixwestin ku bi destê wan ermeniyan biqelînin. Hingê tirkan "Alayên Hemîdiyê" berî nav ermeniya dan û begên kurd yê ku ji bo berjewendiyên xwe bûn hacetê destê tirkan rola xwe leyist. Lê belê, divê bihê gotin ku di nav axa û begên kurdan de gelek hebûn ku ermenî diparastin û baş fêm dikirin ku ev leyistika qirêj ji ku dihat. Şahidê wan bûyerên gelek nivîskerên rûs û bi xwe ermenî jî hene(5)(r.122).

Divê gava dîroknas li ser babetekî dixebite bi çavekî objektîv her tiştî binêre û heger pêwîst be jî kêmasiyên netewa xwe jî bide xuyakirin, wek dihê gotin "gunehê xwe bide rûyê xwe". Tiştekî veşartî nîne ku li Kurdistanê nakokiyên di navbera olên cûda hebûn û gelek car kurd kêmtolerant (kêmsebir) bûn li hemberî terefdarên dinê cûda yê wek: êzdî, xaçperest û hwd. Gelek car navbera wan de kuştin û talankirinê jî rû daye. Ev bû sedem ku nivîskarê ermeniyan yê nijadperest Rafî di berhemên xwe de bi awayekî xirab qala kurdan dike, her weha ew bû sedemê ku heta niha jî xaçperestên Kurdistanê behsa kuştina merivên xwe dikin û bi dawî ew bû sedemê wê ku êzdî parêzvanê ziman, çand û folklore kurdî ya resen xwe dûrî peyva kurd digirin. Di mejî û hestên êzdiyan de peyva "kurd" û "misilman" her yeke û ev birînên dilê wan heta vê gavê jî kew lê nehatine û dijanin.

Di dirêjiya dîroka xwe de kurd bibûn amûrên destê ereban, farisan, tirkan û hwd. Belê ev prosesên dîrokî ne û meriv dikare gelekî derheqa sedemên wan de binivîse û lêkolîn bike, lê mixabin fakt ev in. Ev faktên min qalê kir heta niha jî serêşandinê kurdan re çê dikin.

Di sala 1914-1918 li dewleta Osmaniyan de dîsa carekî qetliyam rabû, Vê carê jî ber mekîna şerî yê tirkan kurd û ermenî berketin. Ji tirsa misilmanan (tirk û kurd) kurdên êzdî piştgirî li ermeniyan kirin û tevî wan revîn ber bi Êrîvanê û Gurcistanê bi hêviyê ku Rûsya perê xwe bide ser wan û xilas bike. Lê hingê Rûsya qeyserî halketibû û leşkerê xwe ji Qavkasyayê vekişandibû.

Êzdî li gel ermeniyan derbasî aliyê Êrîvanê bûn û bi serweriya Andranîk Ozanyan û Cangîr axayê êzdî du deverên Ermenistanê (Abaran û Serderabad) ji destê roma reş deranîn û êzdî li wan deveran cîh û war bûn(6) (r. 125).

Dema Sovyet hate damezirandin gelek derfet ji bo miletên biçûk wek kurd li Sovyetê çêbû. Divê bihête gotin ku li Sovyetê dibistan, şano, komên folklorî yên kurdî hatin damezirandin. Bi serkariya dostên

kurdan J. Orbêlî û merivên wek wî kurdnasî gelek pêşket, gelek zanyar û kurdnas ji kurda derket in. Kurd bê minet nînin û her tim jî behsa alîkariya ku rûsan, gurcan û ermenyan ji wan re kirî di wextê Sovyetê de dikin. Lê piştî hilweşandina Sovyetê rewş hate guhastin û dema Ermenistan û Gurcistan bûn dewletên serbixwe û nijadperestî gur bibû kurd bûn mêvanên zêde di wan dewletan de. Piştî wê ku germaya agirê serxwebûnê ku mejyê hinek ermeniyan û gurcan ketibû vêsiya, qonaxeke nû dest pê kir. Ev qonaxa "demokratiyê" ye û niha karên berê bi zanistî û propagandayê dihête kirin. Navendên çanda kurdî li Êrîvanê her weha li Gurcistanê jî hatin hilweşandin, para bêtir ya kurdnas û zanyarên esilkurd derketin Rûsya û dewletên Ewropa.

Îro jî hinek zanyarên ermeniyan siyaseta dubendiyê di nav kurdan de derbaz dikin û aşkere behsa vê dikin. Li sala par li Ermenistanê "elfabeya zimanê êzdîkî" ji bo zarokên êzdî hate çapkirin. Li dibistanan de propaganda dînê xirîstiyaniyê di nav zarokên êzidiyan de dikin(7).

Û di dawiyê de pirsa ku bû sedemê vê gotara min ezê behsê bikim. 21-ê kanûna yekê sala 2006-ê li Êrîvanê di rêdaksiyona rojnameya ermenî bi zimanê rûsî "Golos Armênîî" (Dengê Ermenistanê) konferansek hatibû sazkirin.

Encamên wê dîsa carekî piştrast dikin ku hinek zanyarên ermeniyan dewsa ku destê dostaniyê dirêjî kurdan bikin tiştên ku kêrî her du miletan nayê dikin. Bes nîne ku têlêvîziyonên ermeniyan bi şev û roj stiran û reqasên kurdî distirên û direqisin û wek yên ermeniyan bi nav dikin, ew êdî dutîretî û dubendiyê dikin nav milet. Stiranên kurdî wek "Lorke, lorke, xanimê lorke" wergerandine bi ermenî û dawiyê dîsa bi kurdî dibêjin "lorke, lorke" û nizanin ka ev peyva kurdî ya kevnare dihê çi wateyê. Her weha dibêjin ku reqasa kurdên Serhedê ku dibêjinê "koçerî" anko reqasa gelê koçer wek reqaseke ermenî nîşanî dinyayê dikin. Gava ji zaniyarên wan dipirsî ka çima hûn dibêjine vê reqasê "koçerî" ew nikarin bersiveke rast bidin merivan. Her kes li Ermenistanê dizane ku ermeniyên Sasûnê, Mûşê, Wanê û Qersê yên ku di nav kurdan da diman,hemûyan bi kurdiyekê zelal dizanibû. Dema fermana ermeniyan 1915-1918 ew revîn li Ermenistanê û paşê di wexte Sovyêtê komên folklorî damezirandin û li gel kurdan ermeniyên Sasûnê reqasê kurdî direqisîn. Berî 30-35 salî nişkêva ermeniyan stiranê kurdî wergerandin bi ermenî û bi wî awayî bûn dizên folklorê jî. Di salen 1940 û pê de etnografên ermeniyan mal bi mal di nav gundê kurdên êzdî de digeriyan û çek, berik, xalîçe û hwd. berhev dikirin û niha ew nimûneyên kultura medenî ya kurdî (xalîçe û berik, xemil û xişil, çek û zireh) bi navê kultura ermeniyan dihê binavkirin.

Wexta kurd konferansan û semînaran saz dikin merivên ku di lêkolînê xwe de tiştên nerast dinivîsin û dîrokê kajî-vajî û sexte dikin vedixwînin û didin ser serê xwe. Gelo neheqiya kê ye? Dîsa jî neheqiya me ye!

Heger em ciwamêrên wek Virtanês Papazyan, Raçîa Koçer, Avêtîk Îsakiyan, Dêrênîk Dêmîrçyan, Xaçîk Daştênts û hwd. ku zanyarên dirust û dostê kurdan bûn bihînin bîra xwe û hinek zanyarên ermeniyan yê niha bidin ber hev gotinên mezina dihê bîra min "Dewsa şêra mane kundê dêra". Berî çend salan hinek zanyarên ermeniyan yê niha gelek tiştên bêkêr nivîsîbûn û pakî kesekî bersiveke hêja neda wan û gotarek derheqa wan da belav nekir, qey ew jî bû sebeb ku îro ev kes karê xwe yê dijîkurdîtiyê didomînin.

Û ev pirs tenê li Ermenistanê û Gurcistanê nîne, rewş li Azerbeycanê, Qazaxistanê û dewletên din yên Sovyeta berê ku jî kurd bi awayeke kompakt dijîn xirabtire.

Problêma mezin ev e ku serwerê kurdan van tişan pişt guhê xwe ve diavêjin. Gava zaniyar û kurdnasên kurd û dostê kurdan ji Sovyêta berê diçin Kurdistanê û wan pirsa li ber karmendên dewleta federal datînin tenê bi sozên vala vedigerin. Divê saziyek bê damezirandin wek Înstîtûtekî yan komeke zanyaran yê ku dijberî propaganda antîkurdî (dijî kurdîtiyê) bixebite û axavtina neyaran bi karên xwe yên zanistî red bike. Pêwîste çanda kurdî gorayî taqetê vejînin û hîngê kesek nikare bibêje ev stirana ermenî ye, ev reqasa ecemî ye û hwd.

Di arşîvên Rûsya qeyserî de gelek belgename û dokûmentên giranbiha derheqa dîroka kurdan dihên parastin û divêt ew hemû bihêne lêkolînkirin û belavkirin. Gelek nimûneyên çanda medenî ya kurdî di mûzexanê Rûsya û Gurcistanê de hene û divê ew hemû tişt bihê popûlerîzekirin û belavkirin. Ev niqte û pirs me gelek car gotine desthilatya başûrê Kurdistanê û heta vê gavê jî em di hêviya wan de mane. Heta ev tişt neyê kirin xêrnexwazê miletê me wê lîstika xwe bidomîne…

Niha derheqa konferansa me jorê behsa wê kir. Di vê konfêransê de zanyarên ermeniyan yê berbiçav beşdar dibûn û hinek nêrînên xwe jî diyar kirin û gotin ku divê zanistî û zanyar xizmeta ewleyiya neteweyî jî bikin. Ez rexneyên xwe êdî dirêj nakim û ji bo xwendevanan vî karî dihêlim. Ez tenê beşekê ji axivtina wan ya derheqa kurdan ku li malpera ermeniyan de bi zimanê rûsî hatibû weşandin werdigerînim.

21-ê kanûna yekê sala 2006-ê li Êrîvanê di rêdaksiyona rojnameya ermenî bi zimanê rûsî "Golos Armênî" (Dengê Ermenistanê) konferansek bi navê maseya gilover "Zanistiyên civakî û ewleya

neteweyî" hatibû sazkirin. »

Vîktoriya Arakêlova, kandîdê dîroknasiyê, Zanîngeha Êrîvanê ya Dewletê:

Problêm ev e ku dewletê heta niha biryar nekiriye ka rola zanistiyê û derfetê bikaranîna wê li ser praktîkê. Ji bo nimûnê, badî hewa nîne ku rojhilatnasiya baştir di emperatoryan da çêtir dihate teşkîlkirin û pêşketin, ji ber ku wan planên ekspansiyonîst (dagîrkirina) ji bo Rojhilatê datanîn. Ango derfetên bikaranîna zanistiyên humanîtarî ji mêje ku dihên hizirkirin. Lê belê, Ermenistan emperatoriya nîne. Em bêyî hizrên eksponsîonîstiyê ne. Divê armanca dewleta me ev be ku bi çi awayî bijî, enteresên hevwelatiyê xwe çawa biparêze li welatî de û her weha li welatî der. Lê, ez bawer dikim, dewleteke biçûk jî divêt armancên sereke yê wê hebin. Heger em derheqa rojhilatnasiyê bibêjin, ew ê em dikarin bi efektî bi kar bihînin bo gihîştina wan meremên me qalê kir û ewleyiya neteweyî biparêzin. Lê dîsa jî her tişt tûşî problêma tunebûna mekanîzma hevkariya dewletê û zanistiyê dibe. Berî sê salan me konferansek derheqa talîşan derbas kir, çi jî bû sedemê panîkê û aloziyê di Azerbeycanê da. Ev kar gihîşte wê derecê ku esker ketine deverên talîşan yê Azerbeycanê. Giringiya konferansê tenê di warê zanistî nîn bû, lê her weha giringiya wê ya civakî-siyasî bû ya ku nêzîkî enteresên me yê ewleyiya neteweyî bû jî. Bextê me re, hindek strûktûrên dewleta me jî ji me re razî û alîkar bibûn. Lê bêyî mekanîzma hevkariyê dewlet-zanistî ew bûyereke xwesere û ew stratejiya tewayî ya dewletê nîne. Nimûneyeke din.

Bi saya hêza rojhilatnasê ermeniyan êzdî wek grupeke etnokonfesiyonal ya cuda (xweser) hatiye pejirandin. Paşê ew li ser dereca navneteweyî jî hate qebûlkirin. Û ev bi quweta têkoşerên ji bo mafên kêmneteweyan pêk nehat, lê belê bi saya serê rojhilatnasên ermenî bi cî hat. Û ev bû faktoreke giring ji bo ewleyiya neteweyî û em dûrî wê yekê xistin ku em bibûna dewleta bi "faktora kurdî ve".

Bi saya serê lêkolînên akademî ya îrannasên me (ermenî) li Tirkiye faktora etnosiyasî ya nû xuya bû miletê zaza. Têrê dike em bibêjin, ku ev miletekî îranî ye û hijmara wan nêzîkî 5 mîlyonî ye û ew bi çavê dostaniyê li ermeniyan û Ermenistanê dinêrin...

Aşot Mêlkonyan, doktorê dîroknasiyê, birêvebirê Peymangeha dîrokê ya Ermenistanê:

Pir giringe ku lêkolînên derbareyê Ermenistana Rojava bihête aktîvkirin. Dema di salên 80-ê min dest bi lêkolîna problemên etnodemografî ya wîlayeta Erzirûmê kir, min ji xwe dipirsî: gelo ev

çima lazim e, Ermenistana Rojava me bêveger winda kiriye? Paşê min fem kir, roleke çawa giring dikare bilîze bîra dîrokî ya milet. Îro ez bi çavekî din li vê problême dinêrim.

Gelo em dikarin Ermenistana Rojava wek windakirî û bêveger bihesibînin, dema 37 % nişteciyên Tirkiye hez ji tirkan nake, lê 42 % nişteciyên vî welatî xwe li ser tirkan hesab nakin? Îro 90 % Ermenistana Rojava kurd in. Anku ev erd bi faktî Kurdistan e. Nakokiyeke mezin di navbera tirkan û kurdan digihîje. Lê em ji bo vê yekê ne amade ne. Pêwîste Ermenistanê pozîsyona wê di vê pirsê da hebe, da ku bizanibe, bi çi awayî reaksiyona xwe bide. Dibe ku ew roj bihê, dema cînarê me Tirkiya nebe, lê Kurdistan be. Em gerek amade bin ji bo guhartinên jeopolîtîkî di herêmê de. Ew pirs hemû hewceyên lêkolînê ne…

Garnîk Asatriyan, doktorê fîlolojiyê, birêvebirê kafedra îrannasiyê ya Zanîngeha Êrîvanê ya Dewletê:

Damezirandina dewleta kurdî li ser erdê Tirkiyê be, yan li ser erdê Îraqê be xetereke mezine ji bo enteresên me yên neteweyî. Niha dixwazin Îraqê parçe bikin û li ser erdê wê dewleta kurdî ava bikin, ya ku bibe struktureke Rojavayê. Divê em bihesibînin ku heger li gel Tirkiya îroyîn ku êdî bûye dewlet û berê xwe daye Yekîtiya Ewropayê em dikarin diyalogeke konstrûktîv bikin, li gel massiva kurdî ku bêhevsare û nahê îdarekirin bêguman dijî-ermeniye. Û derheqa vê yekê tu hêvî tune ne.

ÇAVKANÎ

[1] Dantsîg, B. Tûrtsîa, Moskva, 1949

Avêryanov P. Î. Kûrdî v voyînax Rosîî s Pêrsîêyî î Tûrtsiyêyî v têçênîî XIX stolêtîa, Tîflîs,

1900

[2] Maêvskî V. T. Armyano-tatarskaya smûta na Kavkazê, kak odîn îz fazîsov Armyanskogo voprosa, Tîflîs, 1915; Mayêvskî V.T. Vanskî vîlayêt, Voênno-statîstîçêskuê opîsanîê, Tîflîs, 1901

[3]Kartsov, Zamêtkî o kurdax, Tîflîs, 1896

4] Kartsov, Zamêtkî o kurdax, Tîflîs, 1896

[5] Gordlêvskî, Îzbrannîê soçînênîa III, Moskva, 1962

[6] Ehmedê Şewêş, Bîranînêd min, Yêrîvan, 1966

[7] Li Gurcistanê jî zarokên êzdî bin tesîra propaganda xirîstyanan de dine xwe diguhêrin.